

Bi xêr hatin malpera Tîrêj...çandî, wêjeyî û hunerîye...

Gotar

Qilçix

[Gotar](#)

Hevpeyvîn

Helbest

Çîrok

Lêkolîn

Çend Têbînîyên Serpêyî Di Derbarê Mediya û Ziman de.

Rêziman

(Çend têbînîyên bilez li dor Mediya û ziman)

Wergerandin

(Rewşa Medya, Ziman û Ragehandinê di nava Kurdan de)

Mûzîk

Hunermend

Keskesor

Zarok

Lîsk

Navên kurdî

Kevnetor

Metelok

Tu dizanî..!?

Weşan

Lînk

Karîkator

Têkilî

[القسم العربي](#)**Ebdulla Peşêw**

Peyvek kurt ji bo Destpêkê:

Mamosta Ebdullah Peşêw, helbestvanê me yê millî di sedsala 21an de, di çaxekî d ku siyasta asîmîlsiyonê li Kurdistanê (bi taybetî jî li bakurê welat) bi çar gavan be bi pêşve diçe, di nivîseke bi nîrx, xalên pir girîng û balkêş tîne bîra me. Şîret rexneyên wî ji rûyê dilsojiyê ne. Ew baş dizane ku di vê sedsalê de dagirkerê Kurdistanê çawa ji teknolojî yê mifayên herî zêde distînin ku hem taybetmendiyên Kurdan yên netewî ji holê rakin. Nîşanên nasnama neteweyek çend tiştên girîngin: Ax, Ziman û Dîrok. Mamsoata Peşêw di vê gotara xwe y dîrokî de bi rindî li ser şîrovekirina van xalên girîng disekine.

Sala 2000an gotar bi zarava Soranî û bi tîpên Erebi di kovara „Baskar“ hejmara de hatiye weşandin. Herwiha di roja 17.04.2002an de di heftenameya „Mîdiya“ d hatiye belavkirin. Di wê heftenameyê da gelek gengeşe û axftin li ser vê gotar



»»»»»»

mamosta E. Peşêw hatin kirin. Heta roja îro jî (ku çend sal li ser weşandina nivîs derbas dibin), ji biha û naveroka gotarê tiştêk kêr nebûye. Bi dîtina min ev nivîs teji rastiyên obcektîv, belgeyek dîrokî ye ku derbasbûna çax û salan ji bihayê w nayîne xwarê. Ji bona wê jî min bi fer(feyde) zanî ku li ser izina mamosta E Peşêw vê nivîsa wî wergerînim ser zarava Kurmancî jî.

Hîvîdarim ku bîr û ramanên mamosta yê Kurdistanî, dûrbînîyên wî yê kûr, dûr dirêj rêyeke nû di qada rewşenbîriya Kurdî veke. Çimkî mîna ku di çendîn cihên w nivîsê de jî hatiye gotin, ger îro em liv û lebateke zêdetir nedin kar û xebata xwe sibe yê gelek dereng be. Hesasiyet û girîngbûna dema ku em têde derbas dibi (dema komînkasyon, sataliyat û înternetê), rêyeke nû li ber me vekiriye. Rêya k dikare hebûna me bi yek carî ji holê rake an jî em bixwe, xwe ji tunebûnê rizge bikin. Her tişt dikeve ser bizav, xwenaskirin û hevgirtina me Kurdan. Elbete di v navê de çîna rewşenbîr, siyasetmedar û partiyên Kurdîstanî xwedî rolekî mezintir girîngtirin.

Kakşar OREMAR

Kakshar_oremar@yahoo.de

* * *

(Ji Tîpên E`rebî û Zarava Soranî Bo Ser Tîpên Latînî û Zarava Kurmancî: Kakşar OREMAR)

Ji mêjdaye ku mesela kesayetiya Kurd û ziman, bala min kişandine ser xwe Şûpandineke hurbînane ya rojname, kovar, radyo û kanalên telefziyonan gele hizir, raman û pirsan diafirînin. Lê ji bo nivîsandineke têr û teji, ku qet neb bersiva hinek pirsên ku xwe ferzkirin an jî xosepandin têde bin, pêwîstiya mirov l hinenk jêderên ku cihê bawerîyê bin û çend salan jî dema xwe jêre veqetandine heye. Ji xeynî vê, pirsgirêkê, peywendiyek rasterast bi siyasetê ve heye. Çimk xuyaye, ku medya saziyeke serxwebûnxwaz bi çavê mediya saziyeke kosmopol (t.1) li ziman û çanda neteweyî nanêre. Nivîsîna akadimî an zanistî heya k bikarîbe xwe ji giştgirî(te`imîm) diparêze û zêdetir meyla wê bi aliyê xane-xan (tesnîf)kirinê, deye. Çimkî her mesela ku destnîşan bikî, bi dehan pirsan dadiûre:

Kîjan zimanê Kurdî yê îstandard? Kîjan mêdiya? ya kîjan qunaxê? di bin sîya kîja rewşa dîrokî da? Ya pîrîvat, an ya hizibê? Platform an jî bîngeha îdolojîkî ya w hizbê bi giştî û ya serokê wê bi taybetî çiyê? Li kîjan para Kurdistanê û bi kîja zaravê tê belav kirin? Kîjan kovar an rojname? Kîjan hejmar? Kîjan kenal? Ay mebest ji mêdiya Kurdî her ewe ya ku bi zimanê Kurdî ji aliyê Kurdan ve t belavkîrin, an wê jî digire ber xwe ku bi zimanekî din jî digehe xelkê? Lê ewa l (zimanê) Kurdîye û ji aliyê biyanîyan ve tê belav kirin? evane û bi dehan pîrsê din.... ji her pîrsêk jî çendîn lik û ta cuda dibin. Ji bona wê jî ji niha de dibêjin min di vê gotarê de bersivdayîna van pirsan ji xwe re nekiriye armanc, belkî ten min xwestiye ku careke din jî dusiya dozeke girîng vekem, ku ew jî doza ziman e bala rewşenbîran rakişînim bo ser rolê mêdiya yê girîng ku di van salên dawiyê d berfireh bûye û pêşketeiye.

Îro em di cîhanekê de dijîn ku bi kulturên cuda-cuda tijî bûye. Hinek ji wa

kulturan şermînin û beriya bikevin nava mala me - koxiyekê, xoxiyanekê - dîkin li derî didin. Lê kulturên din hene, deriyê mala te ji binî derdixînin, an jî dişkênin dikevin hundir. Belê, dizanim ku ti çara me tune, divê pencerekê vekeyin ji ronahî û hewa gûherînê. Gereke pêşwaziya wan bikeyin yê ku li derî dixir Pêwîste bersingê xwe ji wan re vekeyin yê tîn ji bo ku tiştekî ji me bistînin tiştekî jî ji mere bihêlin(deynin). Lê divê em fêrî vê hindê jî bibîn, ka çawa deriy mala xwe li ser wana dadixînin ku dixwazin di wêrane mala me de, me lixav biker mîratê(mîrasê) me û welatê me bigûherînin.

Ev qunaxa dîrokî ku em û dagirkerên welatê me tede dijîn, bi ti awayekê ji qunax dE'rebegtiya sedsalên navîn li Ewropa, pêşkeftîtir nîne. Me ew pêvajo(prose)yê dîr û dirêja geşkirina aborî û civakî nedîtiye, ku Ewropa bi sedan salan tede derba bûye. Me bêy ku di wê pêvajoyê bi xwe de, beşdarî kiribe, tukilê berhemê dîrok wan dixwen û kakila wê jî davêjîn. Telefon, telefziyon, kumpîtor û înternet werdigirîn(distînin), lê wê hişê(bîr û ramanê) red dikeyin ya ku ev tiştanên ha afirandine. Em dikarin tonek pirtûkan li ser dêmokrasîyê binivîsîn, lê qet nikarî bibîn bi dêmokratîkê Ewropayî. Tenê(meger) di encama proseyek domdirêj û pîjan a civakî da, ji xeynî wê, heya êvarê dirûşma aşî, biratî û dêmokrasîyê bêjîn bêjînivê, peywendîya gelên Tirk, E'reb û Faris bi me re qet nabe peywendîya cînavbera gelên Elman, Firansî û Îtalyên Swîsra bi hev re. Dixwazim bêjim, bi wê re ku Ewropî bi sedan sal di pêşîya me dene û bi -ruwalet(bi zahir û ruxsar) qonax netewatîyê derbas kirine, an mijûlîna ku derbas dîkin, lê em dibînin di rewşê pêşveçûna teknolojiya ragehandinê de, her bavo û kesek bizava wê hindê dîke kî rûye xwe, zîmanê xwe, kultura xwe û a'det û taybetmendîyên xwe yê çand biparêze.

Heya niha min di çend helkeftinan(minasibetan) de, hewil daye ku bi nivîskarê Îstonî û welatên din yê Baltîk re bi zîmanê Rûsî bi axivim, lê çiqas teliya peqiyayî (teley teqîw) devê xwe vedike, ew jî hind bi wî zîmanî diaxivin! Herçend e dizanim ku di nava wan de tîkes tune ku di çaxê Sovyetê de jiyabe û Rûsî nezanê!

Siwêdîyên welatê Fenland ji sedê şeş(%6) rûniştivanên welatê pêk tînin, li cizîra Ûlanda jî ku hejmara wan tenê 25 hizar kesin, otonomiya wan heye. Divê em viy jî bizanîn ku otonomiya wan " otonomiya rasteqîne"ya me nîne! ew xwedîyê alîyê xwe yê taybetî ne, perlmîna wan heye, wan destûra lokal(qanonî) heye, het peywendîya wan ya bazîrganî jî bi welatên derve re heye. Ji xeynî vê jî ne Fenlanada re leşkerîyê dîkin, ne jî rêya ti Fenlandiyekê didin ku di nava cizîra wa de ji xwe re e'rdê bikire an jî xanî durîst bike. Zîmanê wan jî ne tenê di cizîra wa bi xwe de, belkî li seranserî welatê da(Fenland), zîmanekî fêrmîye... lê ne mûmkîna te guh li Siwêdîyê be ku bi himzîmanekî din re, an jî Xwedê neke bi zarokê xwe re bi zîmanê Fenlandî bi axive, yan jî zarokên xwe di xwîndîngeheke Fenlandî de deyne ber xwîndîne.

Ger Îstonî û Siwêdî ku xwedîyê dewletê û bi sedan sazî û destgehên çandîne, windakirina kulturê û zîmanê xwe bitirsîn, ê em çî bikin ku ji hemû aliyekî vî ketîna ber renîya(şalawî) an jî hêrişê û pelamara dagirkeran? Dagirkerên me milhur(stemkar), nezan û paşverûyên cîhana vî serdemê ne ku ne tenê ax û sama (mal), belkî navê welatê me jî digûherînin û zîmanê me ji me re qedexe dîkin înkara hebûna me jî dîkin.

Proseya bişavtin(asîlîlasiyon)a Kurda demeke ku hatiye peyakirin û niha jî c germe-germ û di blindtrîn astê xwe da ye û pir xurte. Di nîv sedsala derbasbûyî d înternasyonalîsma bêder û dîwara Kurdan bûye bingeha hizrî û saykolojîya v hellandina hêdî(yewaş) û bê deng. Di salên dawiyê de jî, di encama şikesta leşker û siyasîya rêxistinên Kurdan, banga bêqeyid û şert li aliyekî û Panîslamîsim aliyekî din, dibine bingeha têza(têma)ya hemen bişavitinê. Ger şiyarbûna netewey negehe hewara me û li ser parastina kesayetî, ziman û çanada xwe em bi îsrar nebin, vaye bi eşkerahî dibêjim: Ewa " danerî topî zeman " nedişkênanc gilobalîzim û teknolojiya nû ya zaniyarî yê bişkênin û prosê bi liv û lebattir dikir Qîre-qîr û qîje-qîja- ser cadeyan û anî û birina xelkekî nenas bi nasname û dîrok ax û zimanê xwe re, tiştêkî ji pirsgirêkê nagûherînin. Bêhîvîfî, perçe-perçebûn zelûlîya me ya îro hinek ji nîşanên vê qedera reşin. Di şerê gelên bindest da zima çeperê dawiyê yê bergirî û berxwedanê ye. Girtina wê çeper(senger)ê ji aliy dagirkeran ve, ji têkşikêandina netewe û pêde ti wateyeke din jêre tunye.

Ne merce ku hellandina gelên jêrdest her bi zordarî, ziman jê qedexekirir ragûhastin û tirsandinê be. Nexêr, di bin sîya teknolojiya ragehandin û nebûn şiyariya neteweyî da, asîmîlekirin encameke objektîv a bi hevre jiyana dîr û dirêj gelê serdest û bindest e. Yanî peywendî bi vê ve nîne, dagirkerên me dilovanin a stemkar, bi wijdanin an bêwijdan. Em ne Vîtnamîne, tenê tank û firoke û e'skerê dagirker bibînîn û gelê serdest jî bi hizaran kîlometroyan ji me dîr be. Ti dîwarê kin(şur) û çeper me û dagirkerên welatê me ji hev naqetînin. Em û ew netenê he ayînin, rengê pêstê me yeke û a' detên ji hev nêzîk û dîrokeke tevhev me bi hevr heye, belkî wek Bülent Ecewîd dibêje: " Mîna goşt û hestî em têkelîn!".

Serê min ji gênêtîk û kîmiya dernakeve(jê fam nakim), lê vê rastiyê dizanim k aliyê pir(zêde) û bi hêz hertim bi ser aliyê kêr û lawaz de serdeste. Viya dizanim ku ger rengêkî zêde û tîr(tejî) bi rengêkî kêr û -kal- re bîn têkhel kirir ewê yekê bi serê yê du-duyê de zal dibe.

Hellandin proseyek li ser xwe(hêdî), veşartî(nediyar) û domdirêje, bi salek û d salan encamên wê xuya nabin û nayên dîtin. Di dîroka dîr de şûnewarê bi deha gelan hatiye birrîn(bi dawî bûye). Di dîroka nû de jî bi dehan netewe li be candayîne ne û hinek ji wan jî(mîna Hindoyên sor yên Emrîka û Samîyê Iskandînaviya) mîna tiştêkî - degmen- û îgzotîk tînin parastin. Yekîtiya Sovyetê y berê, mîna amirazekî hellandina hêdî û li ser xwe ya kêrnetewan, baştirî nimûneye:

Di destpêka salên 1980an de komara Kazaxistanê pazde milyom û pêncî û sêhiza (15,53000) kes bû(1). Ji vê hejmarê tenê pênc milyon û sêsed hizar (5,300,000) ke Kazaxî bûn(2). Ger wiha be, di çaxê 60 sal desthilatdariya Sovyetê de Rûsê birayên mezin karîne bibine zêdetir ji nîva xelkê Kazaxistanê.

Hejmra Latîvîyan di sala 1940an de du milyon(2,000,000) kes bû(3), lê di sal 1981an de(37 sal piştî dagirkirina wê) hejmara rûniştvanên vê komarê bûye d milyon û pêncsed û sî û neh hizar(2,539,000) kes. Lê ji vê hejmarê tenê ye milyon û sêsed û çil û çar hizar(1,344,000) kes Latîvî bûn(4). Wate di çaxê ç salan de gelê Latîvî ne tenê zêde nebûne, belkî kêr jî bûne û di komara xwe d zêde nemaye ku bibin bi kêmanî! Ger prostrokaya Gorbaçov nebaye, sed komar"ên wan jî hebane, tiştêkî wan nedima û ji holê radibûn!

Rewş û halê komarên din yê Sovyetistana berê ji halê Kazaxistan û Lativiy baştir nebû. Li bajarê Bako yê paytexta Azerîyan, Azerî hindikayî(kêmîne) bûn. I BîleRûsiya û Ûkraniya, ger tenê di kore gundan da, lê weke din heya zimanê Rûs hebaye, tikesî bi zimanê xwe, dev venedikir. Bi dehan gelên biçûk ku tenê bi na xwediyên otonomiyê jî bûn, bi yekcarî hellbûn(bişivîn) û hinek ji wan jî wiha can xwe li dest didin û li ber sekretê ned. Di sala 1930an de herdu netewên resen yê Sîbiryayê "Hantî" û " Mansî"yan otonomî standin. Di serjimêriya sala 1969an de wate piştî nêzî 40 salan, bi her du netewan tenê %3 gelê herêmê xwediy otonomîya xwe bûn"5".

Ger ev hal û rewşa gelên" Welatên karker û cotyaran" be, ê divê rewşa Kurd perçe-perçebûyî û bindest çawa be, ku dagirkerên welatê wî ji Stalîn û Bîrya Jidanov jî paşverûtirin?!!.

Dagîrkerên Kurdistanê ti sedemeke asîmîlasyonê nemaye ku derheqa Kurdan d bikar neînin:

Qirkirinên bi tevhev(komel), kavilkirina gundan, dagirkirina raste-rasta leşkerî sirgûnkirin(dûrxistin), înkarkirina Kurdan mîna netewe, ...hwd.

Lê şeweya herî bi bandor ji bo hellandinê, ku dagirkerên Kurdistanê bê awayek cudahî piştî xwe pêve girê dane, ji navbirina zimanê Kurdî ye. Hinek ji wan rû t rû û rasûrast mîna zimanek serbixwe înkara hebûna wê dikin(Sûriye û Tirkîye hene zimanê Kurdî davêjin pişt guhên xwe wek zimanê xwîndin û zanist mêdiyayê(Îran), hene jî dipejirînin mîna zimanekî serbixwe, lê bend û zincir dike û rêya geşkirinê jêre nade û nahêle mîna zimanekî îstandardê fêrmî cîgir bib (Îraq).

Ziman mîna laşekî bi can an jî giyan li berekî zindîye. Mîna coyê avê ku ge berê wê vala nebe, liv û lebatê neke, neçe, zêde nebe, wa piştî demekê dibe zelkav (batlaq). Zimanek ku di xwîndingehê de bikar neyê, rojane di destgehê ragehandinê de nefesê nekişîne, di dem û destgehên fêrmî da pê neyê nivîsandir divê çi paşerojek jêre hebe? Zimanê Kurdî bi çend zimanên din yê xwedî otorîtê hatiye dorpêç kirin û heya ku tê(dem derbas dibe), helqa derdora wê digehe hev teng dibe. Belê di çend deverên Başûrê Kurdistanê de rewş baştire, lê ger t awayekî horbînane em bala xwe bideyne wî alî jî, têdigehe ku siyaset E`rebîkirinê heya kûderê çûye û çawa kesayetiyê ferhengîya Kurdî hingavtiye.

Di encama şerê kendavê de, piştî serhildana xelkê Kurdistanê û ramalîna dem destgehên Bees, pêwîst bû desthilatdar yekser dest bi Kurdîkirina jiyana rewşenbû û herifandina kultura dasepandî ya dagirkeran biken. Diviyabû wan di dema he kin de karekî wiha bikirana ku zarokên Kurd dema berê sibê diçine xwîndingehar pirtûkên bin kevşê wan, bi zimanê zikmakî yê wan bixwe be. Edebiyat, e`rdnigai (jeografî) û dîroka welatê xwe bixwînin. Pêwîst bû rojname, radiyo, kenale tilfiziyonî, namegûhrandin(nivîsandin)a destgehên fêrmî û gelek tiştên din bibin t Kurdî. Pêwîstbû di dema herî kin de akademiya zaniyarî pêk bihata û hem îmkanên ji bo çêkirina ferhengnameyekê ku cihê baweriyê be û însîklopîdiy Kurdistan, bèn cî bi cî kirin. Ev karên wiha an nehatine kirin an jî bi xavî hatin kirin. Vê hîndê bese bêjim: heya sala derbasbûyî jî, tenê dera ku di nava azmo (taqîkirin)ên bekeloriya cih negirtibû, zimanê Kurdî bû!!!. Heya niha jî parek

berçava bernamên tilvizyon û radiyoyan, bi taybetî jî ew bernameyên ku ji bo wê derbaskirinê tèn nîşan dan, bi zimanê E'rebî, Tirkî û Farsîne(eger hinekî din zêde nekiribin!!!). Piştî neh sal jiyana bê Bees, hêştê jî E'rebî mîna ziman yekemîn û fêrmî cihê xwe bernedaye. Xelk, bi taybetî jî rewşenbîr, heya lê pêkenîna xwe jî nuqimî zimanê E'rebîne û bi E'rebî bîr dikin. Muzîka E'rebî Farisî û Tirkî di nava hemû malekê de, li hemû cihê rihetiyê û rabarandinê, gazînc çayxane û taksîyekê de şev û rojan diqêrîne.

Ragehandin rolekî bilind di gûherandin û bi hêzkirina curê hunerîya civatên xelk de dilîzin, bi taybetî di nava xelkê sade û nexwende de. Heya radeyek zêde li ser peywendiya di nava civak û zimanê zikmakî de bi bandore. Mêdiya berpirsiyar e c wê hindê de ku netewe heya çî radeyekê ji zimanê zikmakî rêzê digire. Netewek k di hîvîya wê hindê de nebe, ku rojek ji rojan zimanê wî yê bibe zimanê dewlet desthilatdariyê, netewekê ku qet parçe peroyek mîna remza nîştimana wî jê nedabin xuyanîkirin, milletek ku di mediya(ragehandin), bi minasibet bêminasibet, rojê sedcaran ji welatê wî yê nîv azad û parastîyê wî re bê gotin: herêma Kurdistanê Îraqê"... divê bi çî çavekî li taybetmendiyên xwe binêre? Wey Gelê Basik çiqas gêjin ku ji welatê xwe re nabêjin" herêma Bask ya Ispaniya' Albanîyên Kosovo çiqas ehmeq û gêjn ku çav li me nakin û ji welatê xwe re nabêjin" herêma Kosovo ya Ugosilaviya", ew Sikotlendî çend gêj û wêjin k nabêjin" herêma Sikotlendiya Bîrîtaniya mezin", an ew Ebxazî çend bêaqilin serhişkin ku ji welatê xwe re navê" herêma Ebxaziya Guricistanê" nahilbijirên. E dikarim bi dehan ehmeq, nîvşikanî(felec), kelho,mirovên nezan û serhişkên di bijimêrim ku siyaset û hikmetê ji me hîn nabin.

Ez bawer nakim Kurdek hebe ku bi dîtina satalayitên Kurdî ji kêfa hiss neke k difire. Di rastiye de wan mala Kurdan avedan kirine û xizmetek bînimune dikir nûne û ber bi pêşve diçin. Ji bona wê jî her rexneya ku ji van sazîyên bihagiran r tê kirin, bi armanca pêşvebirina wane, ne sarkirina karê wan.

Carna li bernamên E'rebî dinêrim, ne bi destê mine, mesela wî polîsî tê bîra min:

Dibêjin polîsek hebû, qet di jiyana xwe de izin(izina rihetiyê) nestandibû. Lê dawiyê de di temenê xwe yê pîrîyê de izinekê distîne. Lê polîsê pîr hemû rojê lê derketina roja berê sibê re, tê, li ber deriyê cihê ku hertim lê disekinî, careke di disekine.

Ne bi destê mine, hinek caran rewşa me mîna rewşa polîsê navbirî tê ber çav. Ê. va ne carek ji carane ku me izin ji xizmetkariyê standiye, lê dîsan bi piyê xw careke din tèn ber deriyê cihê polisan.

Dibe bê feyde nebe, di destpêk an jî dawîya bernaman de, deng û behsê Kurdistanê bi zimanê biyanîyan jî bîn weşandin. Lê tenê deng û behs, ne tiştê hunerî.

E'reba, ku bi dehan kenalên satalayit û ne satalayit hene, tu bêjî Xwedê wan bîn ser rê(hidayet bike) û demjimêr neh û dehê êvarê li ber TVyên Kurdî rûnin guhdarî stranên Îraqî bikin?! an jî li bernameyek taybetî ya di derbar peywendiyên di navbera Tirkiya û wilatên E'rebî binêrin"7"? an bernameye taybetî li ser pîrsgirêkên derya Qeziwînê?!"8" an jî dibe(mumkine) ku E'rebek

çend çîrokên Kurdî xwîndibin, daku di nava van hemû kenalên E'rebî de ku hene guhê xwe bide du Kurdên ku behsa pîrsgirêkên çîroka Kurdî diken?!(9)

Bêgoman, wek pîrensîp, kes nikare li dijî bernamên hunerî be ku bi zimanên gelê cîran tîn pêşkêşkirin, bi wî mercî ku em jî xwedîyê bi dehan kenalên TV bûna her kenalekê jî bi şev û roj zirme-zirma wê bihata!, lê ewa niha rûdide(diqewime tenê û tenê xwe bi kêmzanîn û valaçûyîna parek ji wan çend demjimêrên ku Kurd hene ji bo ku qe nebe zimanê bav û kalan ji bîr neken.

Encamên Te'riba hêdî ya başûrê Kurdistanê bi ronî ji wî zimanê e'ceb û axaftin derdikeve, ku piraniya xelkê asayî(normal) û hinek ji rewşenbîran pê dipeyivir Carna ger kesek E'robiyê baş nezane, ji wan fam nakin. Telifiziyonekê ku 1 milyonan kes lê dinêrin, divê gelek hişyarî pîrsgirêka ziman be. Ew zimanê ku c saziyên ragehandinê de bikar tê, pêwîste cudahiyek hebe bi zimanê çayxane nandin(mitfaqê) re. Karmendên saziyên ragehandinê, bi taybetî jî tîlfiziyon, div normên zimanê îstandard biparêzin"10". Bisporî û serkeftina di warekî hunerî an zanistî da, ne besin bo wê hindê ku yek ji bo niqêşeke tîlfiziyonî bê bang kirin Divê ew kes, qe nebe heya radeyekê aghdarê wî zimanê niv îstandard be ku îro bo nivîsandinê bi kar tê.

Ez qet bi zimanê petî(xwerû) re nîme û ez di wê baweriyê deme ku zimanê petî c cîhanê de tune. Lê wek Kurd dibêjin:" hemû tiştek bi xiwê û xiwê jî bi me'îna' Ji bo bikaranîn an jî xweîfadekirina daxwazî û kar û barên rojane, bi aghdar dibêjim, ku zimanê Kurdî yeke ji wan zimanên herî dewlemend yê dinyayê. He peyveke biyanî jî ku hatibe nava zimanê me, vaye bav û kalên me kûm cemedaniyek wisa kirine serî, şûtkek wisa li piştê girêdane, wisa mistdane, k xwedîyê wê careke din nas neke! Bab û kalên me qet nehatine peyvekê biyanî gor giramêr û zagûnên fontîka zimanê esilî bikar bînin, belkî hertim bi selîqeye rewan û di dareke xwemalî da darijandine. Ewa ku em niha dibînin tiştekî din Niha peyva biyanî çawaye, wiha jî bikar tê.

Nizanim, ji bo bernamêyek tîlfiziyonî, di zankoyeke mezin û giran da, çima div keçekê hîlbijirên ku nekare du axaftinên rêkûpêk bike? ew jî ne di derbarê felsef zanistê de, belku di derbarê dostanî û hevalbenidyê de! nedibû beriya programî wek dibêjin, bême'îna tama zarê wê biken? çibû, qey zimanê xwelîserê Kurd peyvek têde nebû li cihê "sidîq" bi kar bê? nedikarî bêje" heval", yar, dost, birade nasyar, hemdem... hd" an ger bi E'rebî nebûya, dilê wî danediket? Zimanê Kurdî cihê " zewac"a E'rebî tiştek têde nebû? Kengî û çawa rewaye ku di çend risteya de, ev hemû peyv û gotinên E'rebî bîn avêtin:" eger sêdaqet nebit heyat nabit, em reyî mine", " sêdaqete e'ize şite", a'dat û teqalîd, îhtîfaz, rewabit, efkar, zewac însan, ziruf tehekum..., teisîrat silbî,...hd""11"

Bixwe rewşa rewşenbîran ewqas baş nîne.

Êvara roja 29.05.2000an Kurdistan TVya delal, bi birayekî nivîskar r çavpêketinek di derbarê xwe paşdekişandina Îsraîl li Libnanê kir. Ger kesê k E'rebîyek baş nezane, bawer nakim ku jê fam bike:" Heq(maf), însîhab, îhtîla muhtel, muehel, qenae, quwat, quwe, muqaweme, hucum, qewanîni diwelî, i'ceba cundî, îstî'imar, cinob, qeziye, muzahîm, îhtîmamtî diwelî miweze'ie, xîlafa herekatî Kurdî, meziye, siqilî îhtîmammatî diwelî, halatî îhtîlal, hell be terîqeyek

a'mîlî xarîcî, kîtle, îstîfade, hellêkî nîhayî, esasî heq teqrîr elmesîr, wezi muheyee, hîmayey Kurdistan, merkezî qerar...hd".

Êdî ger ev zimanê nivîskarekî be, li ser êkranê neku li çayxanekê, divê rewşa xelk normalê civakê çawa be?! Mafê wan tuneye ji zarokên xwe re bêjin" birûne xurfe newm"(Herin odeya nivistin an jî razanê), an " Elabekan mebene xurfe îstîqbal"(amrazên lîstokan neben odeya pêşwaziyê!", " Qemîseket le ser xessal danê"!(Kirasê xwe deyne ser cilşûkê". Ger ev rewşa para nîv azadbûyî y nîştimanê be, ku kêman jî zêde bi dehan salan Kurdî têde hatiye xwîndin, ê div parên din çawa bin, ku xwîndingehê Kurdî têde nebûye û hî jî nîne?

□□□□□□□□

Zimanê Kurdî têgehiştineke(mefhumekî) siyasîye. Rûyê wê yê herî diyar(xuyê pîrsgirêka netewa Kurd e. Ji Kurdistanê re sinorekî xuyakirî tuneye û hilkişiyên dakişan(bilindî û nizmî)ya rûberê wê jî bi qasî hilkişiyên û dakişandin(bilindî nizmî)ya zimanê Kurdî ye. Dijimînan jî jî vê fam kirine. Ji bona wê jî, dema Turgut Özal dipirsin:" Hûn naxwazin otonomiyê bidene Kurdan"?, Özal ten ewqas dibêje:" heya sala 1996an herkes yê hînî zimanê Tirkî bibe"!!!"12"

Tirk dizanin, ku Kurd, Kurdayetî, Kurdistan, bîr(raman)a serbixwexwaziyê hwd... evane tev di yek tişt de diyarin: Ew jî ziman e. Ew têgehiştine ku ew birc kelaya ku bi hizaran sal e ev netewa çiyayî parastine, sêhra(caduya) zimanê Kurd ye. Ewan zanîbûn û hê jî agehdarin ku heya ev sêhr(caduy)a han betal nebe, ev Kurdê serhişik ji Kurdayetiyê nayê şûstin!. Ji bona wê jî, Kemalîstên kevin û n hemû hêza maddî û me'înewîya xwe bi kar tînin ji bo xerakirina vê kelayê betalkirina wê sêhrê.

Piştî damezrandina dewlet(komar)a Tirkiyê, piraniya herî zêde ji rûnuştivanê gundên bakurê Kurdistanê, ji xeynî zimanê Kurdî ti zimanekî din nedizaniyê Diviyabû kesayetiyê wan bê bişavtin û tunekirin. Bi rêya wêrankirina gundên wa û koçberkirina wan ya nava bajarên Tirkiyê, Tirkan xwestin kesayetiyê wan y berê bikujin û kesayetiyek din bidine wan, ew jî bi rêya ji bîrbirina zimanê Kurdî hellkirina wan di nava " gelê Tirk yê şad û bextewer" da.

Belê, li Tirkiyê ne tenê Kurd, Tirk jî dikare şahiya Kurdî bike, guhdariya awazê Kurdî bike, roja Newrozê kincên Kurdî bike ber xwe...hd. Çimkî ne tenê zerer ziyana vana ji pez re tuneye, belkî çanda Tirkî dewlemend dikin û zû an derin dibine malê wan û navê Kurda di kundir terr de jî namîne, ji ber wê tovê zima têde nîne. Ne tenê eviya, belkî rêya(azadiya) Kurdayetiyêke vala jî bidin, bi w mercî ku amirazê wê zimanê Tirkî be!

Tu dikarî bê pîrsgirêk li Tirkiyê bijî û heta bibî bi Ismet Înîno, Ecewîd, Hikme Çetîn û İsmail Cem, lê bi mercekê ku dest ji wî zimanê" çiya"yî hilgirî.

Bila yêna mîna Yaşar Kemal tim pirtûkên stor-stor li ser hejarên „Çokorawa binivîsin, lê, bi zimanê Tirkî!

Bila yêna mîna Ehmed Kaya û çbrahîm Tatlıses çiqas ku deng di wan de heye li di çewsandinê biqêrnin, lê, bi zimanê Tirkî!

Di neteweperestiyê Tirkan de xislet an jî taybetmendiyê dagirkerên Firansewî

heye. Ew taybetmendî jî sepandina ziman e. Ger ji Tirka re here serî, bi leş ne, yê te bi can jî bikûje,

kesayetiya te neşirîn û pir kirêt dike û diposîne, yê wisa li te bike ku kînê ji jiyana xwe ya derbasbûyî bikî û ji wê yekê şemê bikî ku ji dayik û bavekî Kurd hatî dinê.

Kemalîstan ne tenê Kurd, belkî piraniya herî zêdeya Kurdan jî bi vê hind têgehandine(agehdar kirin e), ku zimanê Kurdî zimanê mirovên nexwenede, qereç paşkevî, çete û rêgiraye. Tirkî jî zimanê şaristaniyet, zanist, rewşenbîrî pêşkevîne, dayika hemû zimanên dinê(cîhanê) yên zindî ye. Vê rewşê wisa Kurda kiriye ku, ji xwe şermê biken û bêza wan pê neyê ku bi zimanê xwe y zikmakî bipeyvin. Partî û rêxistinên Kurda jî, di piratîka xwe de, ne tenê li dijî v siyasetê nesekinîn, lê herwiha bixwe jî bi rêya mêdya û edebiyata xweve, e siyaset peya kirin û bi navê pêşkevînxwazî û înternationalîsmê, zimanê Tirkî anî nava mala hemû Kurdekê.

Elbete, ez bi giştî behsa tiştê berçav dikim, lê çî di nava refên van partiyan, çî dervey wan, hinek rewşenbîrên naskirî û şêremêrên mîna Musa E'nter helkeftin (rabûne), ku pirsgirêka zimanê Kurdî ji xwe re kirine doza jiyana û mirinê. Li mixabin, têkoşîna van kesên camêr jî, ji aliyê partiyan ve ti piştvaniya ciddî j nehatiye kirin û hê jî nayê kirin

□□□□□□□□□□

Yek ji rûyên here xuya yê mêdiya Kurdan bi zimanê cîranên wan, rûxweşi nişandan(te,aruf) û xwe şirînkirin e li ba wan. Cara wisa heye ku ew rûxweşi xweşirînkirina han digehe radeya zimanlûsî, (temelluq) û dibe ku bandorek nigatî jî bike ser îmajayên wê yê Kurd. Ji xwe bav û kalên me vala negotîne:(" Ne hind te be ku te nexwen û bavêjin, ne hind jî şirînkirin be ku te qût biden."). Wate: „her tiştê sinorê xwe heye“. Mêdiya Kurdî ji xwe re kiriye a'det, bi minasibet û b minasibet, behsa birayeti û hevpariya olî û dîroka hevpar û qedera hevpar dike. Wiha nişan dide, ku jiyana me bê van birayên mezin dozex(cehnem)e. Hemû roj vê hindê ji wan re dubare dike, ku nivîskarên me bi zimanê wan nivîsandine hunermendên me bi zimanê wan stîrîne, zanayên me xizmeta çanda wan kirine zarokên me ji doza wan re fidakarî kirine. Kurt û kirmancî, Xwedêyê mezin ten em bo wê hindê afirandin e ku solan ji wan re danîn. Ev jî bûye sedem ku cîranê me, me bi(bêpê an jî jêr pî)yên xwe bizanin û me nexin nava xaniyekî taybet. Tir ticarî(qet) nikarin bêjin Ermenî û Cihû li Tirkîyê tunene, lê bi rûyekî peyt dibêje ti" kêmetew"yek bi navê Kurd li Tirkîyê nîne. Li dewleta Sûrîyê y pêşkevînxwaz!! çend hizar Ermenî û Asûrî dikarin bi zimanê xwe bixwînin, lê d milyon Kurdên ku him olên(hev ayîn)ên wanin, ji hemen mafî bêparin. Heya Kur zêdetir behsa Selaheddînê Eyyûbî biken, ew zêdetir wî bi yê xwe dizanin! Ji bon wê jî ez di wê baweriyê de me, çiqas ku medya Kurdan li ser xalên hevpar îsrar dike, divê ewqas jî îsrarê li ser wan sinoran bike, ku Kurd û cîranên wan ji he cuda diken. Ew xwecudakirina han bi ti şeweyekê serkêşî û tunekirina wan nîne berevajî wê, naskiririna taybetmendiyên wan e jî. Cudatiya bê dujiminahî jiyana rengîntir û dewlemendtir dike.

Birîna sivkatî an jî xwe bi kêmtanîn û kêmtîna Kurdan, xwedî dîrokek dîr dirêj e. Bi sedan salan E'rebî zimanê ol, Farsî zimanê edebiyat, Tirkî jî ziman desthilatdarî û fermandariyê bûye. Zimanê Kurdî jî, ji şerma van zimanan, xwe be bi çiya û gundan hilkişandîye, xwe layîqî şaristaniyê nezaniye. Hezretê Ehmed

Xanî berî zêdetir ji sêsed salan, wiha fermoye(keremkiriye):
Hasil ji î'nad eger ji bêdad

Ev bêde'te kir xîlafê mui'tad

Safî şemirand vexward dordî

Manendê derî, lisanê Kurdî

Înaye nîzam û întizamê

Kêşaye cefa ji bo wê a'mê

Da xelq nebêjtin ku Ekrad

Bê mei'rîfetin, bê esil û binyad"13".

Belê, xuyaye wê demê jî Xanî li vir û wir bihîstiyê ku " Ekrad " nezan, sivik "bêbinyad" in. Di wê serdemê de jî bi Kurdî nivîsîn tiştekî ecêb û bi sosret û bide't" bûye. Lê Xanî badeya saf û zelal(ku zimanên ne Kurdî ne) davêje û xilt wê(ku zimanê Kurdîye) vedixwe, belkî ji xêra Xwedê zimanê Kurdî jî mîn zimanê Derî tiştekî xweşik yê mîna şahkarên Nizamî pê bê vehûnandin. Ehmed Xanî ne tenê ji bo çend xwîndevanên hilbijartî, belkî ji bo" a'mê" vê cefayê dikişî e.

Wax..., xweziya niha tenê bo demeke kin hezretê Xanî çav lê bûya(bidîta), ku piş sê sed salan ne tenê yê " a'am", belkî hilbijartîyên " Ekrad" jî zimanê şahkara wî t " bide'et" datînin û bi gotinê jî nebe, vaye di piratîkê de jî şermê dîkin ku ev neviyên wî ne û niha jî mîna wê demê şêxê şaêran divê bi ser xwe de bikişîne bêje:

Çi bikim! Ku qewî kesade bazar

Nînin ji qumaşê ra xerîdar"14"

Belê, ew qumaşê bêmimune yê ku hezretê Xanî di çinandina wê de ew hemû cef kişandin e, niha jî li cem neviyên wî bazar jêre pir kesad e û bikir jêre tunen e. Niha jî ji hizar kesan yek jî zimanê wî naxwîne. Li mezarê wî yê teji nor û ronah ji sibê heya êvarê li ser hest û şiyarbûna bi degmen(pir kêr) yek ji ewên ku tirb wî ziyaret dîkin, du peyvên Kurdî di guhê wî de diçirpîne.

Xuyaye Nalî(1856-1800) helbestvanê mezin jî kêr nebûye armanca tan û zima nexweşiyên hinek Kurdan ku Kurdî " îna" kiriye. Bawer nakim ku ev dukela şî ya Nalî bê agir be, çaxê ku wiha kerem dîke:

Kes be elfazim nelê xo Kurdî ye, xo kirdiye,

Herkesê nadan nebê xoy talîbî me'ina deka"15"

Nebûna kiryarê qumaşê kêmpayda(bênimune)yê Xanî û piştê jî henek kirin nezanan bi peyven resen” elfazî xokirdî” Nalî e’yinî ew xencera bi bandore k hezretê Hacî Qadirê Koyî jî heya ser hestîyan birrîye. Di dawîya sedsala 19an d her Baba bû(mîna Hacî dibêje) weke mirîşkê hêka mirwarî dikir.

Carekê hezretê Hacî li Istembolê Kurdekî bajarê Koyê dibîne. Wî Kurdê bajar Koyê xeber û agahîyên li ser rewşa welat li ba hebûn û wesfa kak Ehmedê Şê dike, lê ev bi dilê wî nabe ku Kak Ehmed wergera şer’î û ayetên Qûranê bi Kurd dike:

Çake deka êsta le bo Kurdan

Tercemey şer’î û ayetî Qûran

Waqîen xizmetî le bo Xiwaye

Çi debû ger be Kurdî nebiwaye”16”

Aya Hacî divê çend Kurdên şaşik bi ser dîtîbin, ku li mal, dîwanxan û mizgewtê Istenbolê, bi zimanê xwe nepeyvîbin. Divê bi wê hesta netewîya xwe ya agirî çiqas şerê” cilxar”ên serdema xwe kiribe! Divê çî tiştêkî li wî zatê mezin û norar kiribe ku wiha şûra ziman hilkişîne

Eger Kurdêk qîsey babî nezanê

Muheqeq dayikî hîze w babî zanî

Ger Hacî sed û çend salan beriya niha, wiha ji hinek kesan biqehire ku Kurdin û ber her sedemekê dibe bila bibe, bi zimanê Kurdî nizane(ku mumkine bêsûç jî bin) lê îro, di çaxekî da ku tîre û hozên Efrîqa jî tevan ji xwe re dewlet çêkirine, Hac diviyabû çî bike û ji ” ewladên vê sedsalê” re çî bibêje, ku Kurdî dizanin û p naxivin!.

Di destpêka salên 20an de, ku hêsta, ne înternationalîzima proleterî gehîştib gundê Cirtawe(navê gundekî pir paşketiye), ne Kemalîzim mîna nexweşiyek wegî jêhatibû, ne jî zimanê Kurdî hatibû qedexe kirin, em dibînin ku Kurdekî herêm mirnîshina Babanan, Mistefa Sayîbê xwarzayê Pîremêrdê şaêr, kurtanê xwe xwê dike û bi zimanê Tirkî ji xalê xwe re nameyekê dinivîse!(Wê demê Kurdên k Tikiçîftî dikirin, Kurdperweran ew bi navê ” Cilxwar” binav dikirin). Pîremêrd jî t helbesta li jêr navê ” Misto, wa diyare_ Misto wiha xuyaye...” bersiva wî dide

Misto, wa diyare toş cilxwar ekey

Estot exurê w meylî bar ekey

Name enûsît be zibanî Turkî,

Le millîyet da mayîl be şîrkî”18”

Hewlêra salên 50an baş tê bîra min: her zarokek békêmasî bûya, an jî bavê w

mirovêkî xwînde "efendî" bûya, li xwîndingehê hewil dida ku bi zimanê Tirkî biaxive. Baş tê bîra min, ku gelek çarazan zarokên Kurdên "Cilxwar" henekên xw bi " Kere Kurmanc"an dikirin, ku ji gund hatibûn û Tirkî nedizanîn! Dikarim bêjir ku wê demê zimanê Kurdî nîşana çîneyî bi xwe re girtibû (yanî zimanê çînek taybetî ya civakê bû). Mîaşxwer û efendî w xelkê bazarê Tirkziman bûn, şivan gavan û cotyarên gund û karker û hembal(barkêş,kolkesh) û belengazên bajar Kurdziman bûn. Her baba yê ku hebû, dixebitî heya ku zûye xwe ji "çîn" a yeker rizgar bike û bigehije" çîn" a jortir. Mixabin ewa ku ji pîre Hewlêr re dîrok e, ji bakurê welatê me halxweş û zindî ye.

Îro, di welatê Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî, û Seîdê Nûrisî da, Kurdbû şermezariya herî mezin e. Zimanê Kurdî, ku Pîremêrd bi " bêhevta û bînimune datîne, li wira rûyê wê yê mecilisên rûniştinê nîne û mezinên wira mîna tîrav seretanê ji zarokên xwe dûr dixin ku pê neaxivin.

Dema ku ez li Mosko xwîndevan bûm, min hinek Kurdên bakur jî nasdikirin. E hisabê xwe, tev li ser Kurdayetiyê mişext û aware bibûn. Elheq jî Kurdiyeke ba dizanîn û bi me re(yên çiyayî û Tirkînezana!!) re tenê bi Kurdî diaxivîn, lê hema k serê Kurdekî din yê bakur derdiket, yekser gera ziman digûherî û yekrast "galdir bildim" dest pêdikir!. Başe, raste me got li Tirkîyê zimanê Kurdî qedexe bû, lê Mosko çima?! Vaye me got, li Kurdistanê nabe zaro hînî zimanê xwe yê zikmak bin, lê li Ewropa çima?! Vaye li wir navên Kurdî qedexene, lê li Ewropa evqa Deniz, Orhan, Turan, Eylem û Yildirim çine ku weke kuvarkên biharê şîn dibin?!

Sala par pênc kes bi navê nivîskavên Kurd, hatibûn kongira nivîskarên (Pen cîhanî). Çar kes ji wan, ji bakurê Kurdistanê bûn. Di wan çend rojên ku em t hevre bûn, min nekarî tiştekî wiha bikem ku ew birayên min, ku tev bi ziman Kurdî diaxivîn, di nava xwe de jî bi zimanê Kurdî bipeyvin! Lê ji aliyê din jî t hisaba xwe hatibûn wira ku li ser tore û zimanê Kurdî biaxivin û zimanê m biparêzin! Dema ku di roja sêyemîn de, kongirê li ser pîrsgirêka Kurd konfiranseke taybetî girêda, niwênerê Pena Kurd berî ku bi zimanê xwe yê zikan biaxive, dest bi qisekirina bi zimanê Tirkî kir! Cihê sûsretmayînê di vi de bû k werger jî Kurd bû!!!

Civaknas û bîrmendê mezinê Tirk Îsmail Bêşêkçî, di pirtûka bihagirana xwe da " Çend Gotin Li Ser Ronakbîrên Kurd", li ser vê hindê gelek nimuneyên berçav û cergbir dide ber çav"19": Bêşêkçî behsa doxtorêkî dike, ku li bajarekî Kurdişînê Tirkîziman!! da piraksîsa wî hebûye.

Rojekê jineke gundî ya li hejar ku nexweşe, tê cem wî. Dema ku doxtor rewşa w jinê dibîne, bi zimanê Kurdî pîre diaxive û bi nermî pîre dipeyve. Jinik di cih xwe de sar dibe û ji doxtor dikeve nava goman û dudiliyê. Ew jinik ténagehije k çawa kesek ku bi Kurdî biaxive doxtore! Êdî çî çare ji doxtor ra namîne û bi serê wê de diqêrîne û sivaktiyê û heqaret pê dike ji bo ku baweriyê pêbîne ku ew doxtore!"20".

Carekê di girtîgeha Diyarbekirê da, dengxweşek lawika " Bêrîvanê" distire. Nişkave, di hocreyeke din da, kesek bi Tirkî destpêdike û strana wî dibire diqetîne Dema ku jê dipirsin te çima wisa kir û te nehişt ew heval strana Bêrîvan berdewam be? Ew Kurd dibêje: " Gelî hevalan, ez intirnationalîstim"! „21"

Yek ji aloziyên dijwar di xebata netewa me li bakur, cudakirin û ji hev veqetandin zimanê Kurdî û xebata Kurdayetiyê yê. Ziman, edebiyat û dîroka Kurdî c programa partiyên de rolekî xuyakirî nîne. Zimanê Kurdî nebûye amrazê Kurdaye û pareke kesayetiyê welatparêzan. Helwêsta medya bakur di derbarê rolê ziman c huner û edebiyatê da, vê cudakirinê bi eşkerahî nîşan dide.

Pir caran dengxweşên mîna Ehmed Kaya weke dengbêjên Kurd û xwedî berhemê mezin yên mîna Yaşar Kemal jî bi nivîskarê Kurd tînin hesabandin. Ev jî, ne tenê rûyê siyasî ve, belkî ji rûyê zanistî ve jî çî girêdana wê bi rastiyê ve tuneye û ten nîşana xwe kêmzanînêye. Ger Kurdekî Kurdîzan bi zimanê dagirkeran bistire bixwaze û nexwaze, di Tirkîkirina Kurdan de beşdariyê dike. Ew stranbêj çîqa serkeftî be, ew qas jî bi tehluketir e. Çimkî ew zimanê dasepandî li ber guh şirî dike û canê berxwedan û bergiriyê di nava hunerê de dikûje.... Çimkî folklor kelepûra neteweyî ji Kurda didize û ji neteweke din re dike milk û saman.... Çimkî zimanê dagirker dike bi parî, bi awaza resena Kurdî çewir û nerim dike, daku Kur bikarîbe wî parî daûre. Astengî ji aliyê Kurdan ve kêmترین li dijî tiştê ku ji rêy Kurdekê ve jêre bîn.

Ziman, ne tenê bi taybetî ji Kurda re, kerestê huner e, belkî armanc û nasnameye j Tişekî zimanê me jî ji zimanên din yên ser rû e'rdê ne kêmîre. Di nava şeş hizî zimanan de, Kurdî yek ji çîl zimanên herî mezin û belavên dinê ye. Ji bona wê j herkesek piştî xwe bidê û bi Tirkî bistirê, dengbêjekî Tirk e. Herkesê ku bi ziman Tirkî, bi armanca afirandinê, pênuşê bi ser kaxezê de bîne, nivîskarekî Tirk e. D vir da ez van kesan, bi ti bandoreke nêgatîv, an jî bi bêrewştiyek(bêexlaqiyek) tawanbar nakim. Ez di wê baweriyê dame ku mirov azad e. Hilbijartin instrumentê strîn û nivîsînê jî, (ku ziman e), parek ji wê azadiyê ye. Lê bi ti away durist nîne, kesên wiha bi nivîskar û hunermendên Kurd, bîn hesabandin.

Carekê Moemer Qezafî yê serokê Lîbîya, ku ez mîna Kurdekê nikarin rêzê jê negirim, di gotarekê de behsa mezinahiya E`reban dikir. Yek ji belgeyên wî ew b ku William Shakespeare nivîskarekî E`reb e. Çimkî, li gor gotina Qezafî, navê w yê rastîn „ Şêx Zûbeyir “ e!

Carna em ên Kurd jî dixwazîn ku hemû William Shakespeareên xelkê bikin Şê Zûbeyirên xwe!

Ewa ku ez behs dikim babetekî girîng yê edebî yê pekgirtinê ye û demeke dirêj ku li cem xelkên din bi dawî bûye: bi zehmet E`rebek peyda bibe, bêje „Albei Camo“ nivîskarekî E`reb e, herçend e ji dayik û babekî E`reb hatiye dinê. Çimkî Firansî zimanê wî yê nivîsandinê bûye û xizmeta ziman û kultura Firansî kiriye. Rayinê Rîlkê“ bi esilê xwe Çêkiye. Zimanê Çêkî jî zimanê wî yê zikmakî ye, l kesî nebihîstiyê ku bêjin Rîlkê helbestvanekî Çêkiye, çimkî zimanê ku w pênivîsandiye, Elmanî ye. Yek ji helbestvanên herî mezin yên Rûs“ Mendelştam bi esilê Cihûye. Lê di însklopêdyakê de nehatiye gotin ku Mendelştam şaêrek Cihûye.

Erê... birastî! ji xwe mezinitirîn şaêrê Rûs Elêksandêr Poşkîn, bi esila xw Hebeşîye! Tu bêjî Hebeşî jî sibe dawa Poçkînê xwe ji Rûsan neken?! An jî qe neb li cihê Poşkîn daxwaza hinek firokên Suxoy ji Rûsiya neken!?

Ji bo destnîşankirina nasnameya nivîskar, dengbêj û şanokar û ...hwd, berher girîng nîne. Yanî girîng nîne ka hunermedek di debarê çî de dinivîse an jî distire belkî girîng amraz e - bi çî zimanî dinvîse, distire an jî diaxive. Herwiha jêrdê bayolojî yê nivîser û hunermend qorşekî şewtî naîne: Îbrahîm Ehmed „ Janî Gel di debara xebata gelê Cezayêrê da nivîsandiye, lê bi nivîskarê Kurd tê hîlbijartir Berevajî wê jî nabe kes James Allridge bi nivîskarekî Kurd bihesibîne, gerçî li se pîrsgirêka Kurd nivîsandiye û pehlewên romana wî “ Çek û Çiya“ tev Kurdir Çimkî amrazê wî yê nivîsandinê ne Kurdî ye.

Madem ku ez behsa hunermedekê dikim ku afirandkarê wê bi esila xwe Kurd e lê zimanekî din kiriye bi amraz û xizmeta kultureke din dike, dixwazim li se xaleke girîng bisekinim:

Dema ku em bi yek çav li hunermedekî Kurd û hunermedekî Tirk, an E`reb Farsî yê bi esila xwe Kurd dikin, jî rûyê saykojî ve çiqas xwe bi kêm bizanîbîr ewqas jî zêdetir emê xwe kêmîr bihesibînîn û wisa li nivîşên paşerojê dikeyin k rêya hêsan bigirin ber xwe û xwe toşî şereşeq û nexweşiyên neken û dest ji ziman biçûk û perçe-perçe û di bi teiqîbê yê Kurdî hilgirin û navê Xwedê û pêxembera lê binin, ew jî mîna nemir Mihemed Qazî şahkarên edeba cîhanê bo ser ziman Farsî wergerînin. An jî mîna bi dehan kesên weke Selîm Berekat û Bilind Heyder roman û helbestên bedew bi zimanê E`rebî binvîsin, an jî mîna Ehmed Kaya Îbrahîm Tatlıses bi Tirkî bistirin. Li aliyê din, nanekî bi rûn(çewir)tir û ji vî alî Kurdê bêkes xwe pê bilind dikin û şanaziyê bi wan dikin.

Nivîserekî Kurd yê hêja, di gotarekê da, tenê û tenê du seran di jiyana ruhî y Kurdan de dibîne: Melayê Cizîrî û Selîm Berekat. „22“

Ez bi ti awayî naxwazim ji qîmeta Berekat kêm bikim, lê ger bixwazim di nav hemû Kurdan de du qutiban hîlbijêrim, dibe ku yê yekemîn Melayê Cizîrî “Şebçiraxê Kurdistan“ be, ku deryayek wisa kûr bûye, sed rûbarên mîna Nîl û Firat di nava dilê wî de têper bûne û ew pênehesiyaye!:

Sed Nîl û Firat tîn û derin qelbê meda

Pênahesîhîn, qulzim û deryayim ez“ 23“

Belê melayek ku mêhraba wî pêre be û amadebûna xwe dabe nîşan dan, mîna arfekî rasteqîne, mîna durnasekî bêmimune, rû bike Laleşê, rûgeha muqedes Êzîdiyan, zatekî wiha nikare ku alî am jî qutib nebe:

Dil geşteme ji dêrê, naçim kenîştêyê qet

Mêhrabê wî bi min ra, were da biçîne Laleş“ 24“

Lê ji bo qutibê du-duyan em çî biken? çî ji her du pîrên terîqeta Kurdayet Ehmedê Xanî û Hacî Qadirê Koyî bikeyin, ku bi hemû hisabekê ji şaêr mezintirin? Li kû cihê Pîremêrdê mîna deryayê vekeyin?

Birayê me yê nivîskar wisa dizane ku Mihyeddîn Bin E`rebî û Edonês di edeb E`rebî da, William Shakespeare di ya Ingilîzan da, Cêrvantês di ya Îspanan da

Destoyufskî û Poşkîn di ya Rûsan da... çî rolekê wan hebûye, ji bo Kultura Kurd jî Selîm Berekat xwediyê hemên rolê bûye û „hêjatirîn û ronaktirîn medaliya“ye ser singê çanda Kurdî“25“.

Eva jor bi eşkerahî û bêveşartin zimanê Kurdî û Kurdayetiyê ji hev diqetîne. L edeb û çandê de ti çiyekî ji bo ziman xuya neke. Mîna wê hindê ku bibêjî zima hestîbend(heykel)a edebê nebe!

Mehmud Derwêş û Edonîs, ku Selîm Berekat bi rewanbêjtrîn dikê taxê û kilîldar zimanê E`rebî danîne“26“, xwedî mafîn ku şanaziyê bi wî biken. Ew ji girîngiy ziman fêhmî dikin û dizanin Selîm Berekat jî bo jiyana wan ya meynewî kêmkirî nekirîye. Lê rewanbêjî û E`rebîzanîna Berekat çî bi Kurdekî belengaz de ye?! T bêjî ji bo ziman û toreya Kurdî Berekat jî Xanî, Nalî, Hacî, Pîremêrd, Goran E`rebê Şemo mezintir be? Tu texmîn dikî nivîsên vî rêzdarî, di gundên Kurdistan da, ji helbestên Cigerxwîn û Qanî jî zêdetir dest bi dest geriyabin û bandor li ser jiyana meynewîya xelkê hiştîbin?

Ez careke din dubare dikim, ku bi qasî muyekî jî naxwazim ji nirx û bihay nivîserê jêhatî Selîm Berekat kêmkirî. Min tişek jî nedigot ger çiyekî taybetî c edeb û toreya E`rebî an jî cîhanî da, jêre bihata dayîn. An jî li ser rolê eşkera y nivîskar di nasandina doza Kurd bi birayên E`reb re, behs bihata kirin û bi qasî v hindê jî şanazî pêve bikira. Ez behsa paye û bilindahiya nivîskar nakim, belkî dixwazim îsrar û teqezê li ser rolê ziman di jiyana meynewî ya mirovan de bikem.

o o o o o o o o o

Berpirsyarên Tirk pirî caran şekirê dişikênin, goya ti cûdahiyek di navebra Kurd Tirkan de tune. Tu bêjê, ew hema vê ji xwe dibêjin, an jî xwegirêdana Kurdan t ziman û kultura Tirkan ve vê cesaretê dide wan? Di bajarên bakurê Kurdistanê d zimanê Tirkî tozê dike. Ger tenê bi hejarî û perpotiyê nebe, ji xeynê wê Kurdek Tirkek bi çî awayî ji hev tîn cudakirin? Di wan hemû civînên ku di bajarê Kurdistanê da tîn sazîkirin, çima gelo qey kesek bi Kurdî zimanê xwe vedike Diroşmek bi zimanê Kurdî tî nivîsandin? Serok an jî şaredarek bi zimanê xwe y zikmakî diaxivê? Carekê niwênerên Kurd daxwazname birin cem desthilatdarê Tirk û rêxistinên navnetewî û ji wan re bêjin, em dixwazin îsal zarokên me t zimanê Kurdî bixwînin? Carekê ji bo vê armancê bi rêpîvan, mêtîng, girev birçîbûnê an jî xwebirçîkirinekê dinya hejandin?

Ger tiştek hebe û li ber çavan be, qet înkara wê nayê kirin. Ez nabêjim bîst milyo Kurdên bakur, belko, ger tenê milyonek jî bi eşkerahî û raste-rast bi zimanê xw biaxftana, Tirkan nedikarî bêje Kurd tunene. Ew înkara hebûna me dikin, çimkî c piratîkê de ji vî înkare mifayê distînin. Bi awayê rojane jî berhem ji xebat hewlên xwe diçinin, dema ku dibînin Kurd bi zarokên xwe yên di nava dergûşê d jî bi Tirkî diaxivîn!!. Tirk înkara hebûna me dikin, çimkî em bixwe jî li ser hebûn xwe bi îsrar nînin. Ev bi îsrahebûn û destpankîrin e di nava medya Kurdan d eşkera ne.

Li pilakartên meşên berdewam û zêde yên birayên me di Medya TV de binêrin. L vî Ewropa azad de peyveke Kurdî tîde tune. Çima divê li Elmaniya pilakart t zimanê Tirkî bîn nivîsandin? Tu bêjî Kurd baweriya xwe bi wê hindê anîbe, ku n

tenê Kurd, belkî Elmanî jî tev Tirkî dizanin? Gelo tu bêjî mirovê Kurd bi vê hind bawerî anîbe, ku ne tenê Kurd, belkî Elmanî jî hemû Tirkî dizanin?! Elmanek Hollendiyek ger li “yaşasin” û „barş“ fêm biken, ezê girewê bi were dikim, ku c demeke kin da ne tenê ew, belkî „qardaş“ên me yên Tirk jî hînî peyva „bijî“ û aşî“ dibin!

Hinek tişt hene, bi nêrînek asayî û sade pir kêmqîmet û poçin, lê, ger heyamekê ser yek ji wan bifikrî û tevan bînî ber çavên xwe û piştîre bi hûrî li wan binêrî pêde biçî xwarê, dibînî ku ev tiştên biçûk şûpeke kûr li ser dil û hundirî xelk dihêlin. Bi taybetî jî ku di nava medya Kurdan de dubare û dehbar tên kirin:

Pêrar Medya TV bi dehan car firokeyeke neyar nîşan dida ku dikeve xwarê. Ev bo her Kurdekî bi namûs xebekî xweş bû. Lê ji nişkave, Gerîllayekî serê çiy hawar dike:” düştü!” Ez di wê baweriyê deme ku, bi qasî moyekê ziyar bi xebat hevpara proltariya Kurd û Tirkan nedigehişt, ger wî Gerîllayî li cihê” düştü” bigota:” Ket”!. Ev tiştêkî biçûke, lê wateyeke pir mezin têde heye. Vê rastiya digehîne, ku Tirkî zimanê Gerîlla û çiya û şoreşê ye jî!

An jî çend caran heman TV kiçeke Elmanî nîşan dida ku piştîre, hizar heyf mixabin, di şer da ji aliyê Tirkan bi dilî hat girtin. Di rûniştinekê da, ji wê keçê t daxwaz kirin ku stranekê bêje, ew jî nake nemerdî, bi Tirkî destpêdike. Elbete guneha vê keça fidakar tine. Wê bi wê armancê welat û cihê xwe terikandiyê berê xwe daye wan çiya û gelîyan, heya ku bergiriyê li ax û çand û ziman belengaztirîn neteweya rû erdê bike. Di vê navê de ew kes gunehkarin yên, ku c wan çiya û newalan da li cihê zimanê Melayê Cizîrî û Hezretê Ehmedê Xanî, ev hînî Tirkî kirine. Çima ne? Zimanê fêrmî yê hemû kom û civîn û kongireyê partiyên bakur, herwiha zimanê rojane yê qirargeh û bargehên wan, tenê Tirkîye Take rojnameya Kurdan li Ewropa“ Özgür Politika“ jî bi wî zimanîye. Di telefizyonê de sazîya herî zêde ku gel li dora xwe civandiyê, li zimanê Tirkî mîn zimanê fêrmî tê nêrîn. Piraniya babetên gerim û siyasî jî bi zimanê Tirkî ne Piraniya êvarîyan di kunca destê rastê ye îkranê Tvyê de wiha tê nivîsandin Canli“ û êdî wê êvariyê kes bi Kurdî naaxive û deng ji kesî dernakeve. Wis lêhatiye ku zimanê Kurdî tenê bi tenborê re ji bo lêlê û lolo bi kar tê û bes!

Asayîkirina zimanê dagirker û şirînkirina wî li ber guhê mirovê Kurd bi eşkerahî t peyakirin.

Kurd li dervey radeyê bi serokên xwe ve girêdayî ne. Her zimanê ku serok jî p biaxivin, cure serketenikê distîne û li ber guhê wî şirîn dibe. Ma mixabin nîne k serokê HADEP, hêja Tûran Demîr, di rojêke mîna Newrozê da, ji bo bi dehan hiza kes Kurdan û li ber çavê niwênerên parlamana Ewropayî bi zimanê Tirkî biaxive Êdî çawa Ecevît nebêje Kurd û Tirk mîna goşt û hestî hev girtine.

o o o o o o o o

Karê herî bi tirs û tehluka ku Medya TV destpêkiriye, di bernameyekê d têkelkirina Kurdî û Tirkiyê ye . Yanî gelek caran bernameyek bi Kurdî ye û nişkave Tirkî dikeve nava bernama Kurdî. Bi taybetî jî bernama „ Sêla Sor“, Nêrîn“ û “ Ronahî“.

Ev karê wiha li hemû dinê, di ti Tvyeke da çênabe. Eger tişteki wiha jî çêbibe yekser werger mudaxilê dike û gotinê werdigerîne. Çimkî herkes zimanê xw serbixwe bihesîbîne, divê hertim vê statusê biparêze. Ti Bêlrûsek tune ye ku ziman Rûsî jî zimanê xwe baştir nezane, lê nemumkine ku kesek di bernameyeke Bêlrûs da bi zimanê Rûsî bipeyve. Xwedê neke ger kesek tişteki wiha kir, yekser nahêli biaxive an jî gotinên wî werdigerînin. Bi vê re gelê Bêlrûs statusa zimanê xwe mîna zimanekî fêrmî û serbixwe, diparêze. Divê vê jî bizanîn ku ev du ziman pir hev nêzîkin û Rûs û Bêlrûs bi hêsanî ji hev fêrmî dikin. Ji Kurdan re tehlûke hê mezintir e, çimkî Tirkî haşatiyê li hebûna Kurdan dikin. Beriya hemû tişteki ji bê wê hindê ye ku wisa dizane her Kurdek Tirkî dizane û pêwîstî bi zimanekî di tune ye!

Kesê ku Kurdî nizane, çima tê bernameyek Kurdî an jî peywendiyê pêre dike Tenê ji bo bêhurmet kirina zimanê Kurdî? Ku dixwaze bi zimanê Tirkî jî biaxive çima divê bernamevan bê sê û du bêje: “Buyrun efendim!”. Dema ku ev jî go çima Tirkî bo ser zimanê Kurdî wernagerîne?! Çima vê rastiyê ji bîra dike k Kurdî û Tirkî du zimanên ji hev cudane? Çima vê rastiyê ji bîra xwe dibe k Kurdên sê perçên Kurdistanê(başûr, Rojhilat û Başûrê Rojava) hê jî ji medeniyet dûrin û Tirkî nizanin?!!

Bargeha Medya TV di dilê Ewropa daye. Ji hemû gund û bajarên Kurdistanê Kurd hatinê û têde kar dikin. Ti bajar û bajarok tinene, niwênerên hemû diyalêkta têde nebin. Ji bona wê jî, Medya TV dikare bibe destgehê bi bandor û kargêr ji b belavkirin û pêşxistin û standardkirina zimanê Kurdî. Dikare diyalêktên ziman Kurdî bike jêderekî bêdewiyê zimanê standard û bi têkelkirina diyalêktan hizara peyv ji buxça deverê derxîne û wan bêxe nava xizîna zimanê netewe. Dikare hemû bernameyên xwe bi her du diyalêktên serekî yê xelkê Kurdistanê, bi hev biweşîne, neku me bike çend milletokên cuda-cuda(Soranî, Kirmanc, Zaza û.. hwd).

Ev pirsgerêk ger zû neyê çareserkerin, vaye karekî gelek negatîf ye deylene ser doz me ya netewî û ji rûyê saykolîjîve Kurda amade dike bo ji hev veqetînê. Dengûbas û bernameyên din da, nabe ku diyalêktên zimanê Kurdî ji hev bê cudakirin û kesayetiyek serbixwe ji yekî re bê dayîn. Bo nimune, kufre û kufir mutleq ku dengûbas carekê bi Soranî bin û carekê jî bi Kirmancî. Hîvîdarî Medya TV jî di bernameyên xwe da, mîna „ Kurdistan TV“ û „ Dengê Emrîka“ her du diyalêktên serekî yê zimanê Kurdî bi hostatî û şiyarî têkel bike. Pirsgerêk birêvebirina bernameyan bi her du diyalêktên sereke(Kirmancî û Soranî) têkelkirina wan pir gerim û ektûel e. Girêdan û peywendkirina wişeyî ya yek wan diyalêktan bi bê ya din û ji hev nêzîk kirina bi ya din re, çiqas ku z destpêbike hê jî direnge.

Mixabin, di sazî û destgehên fêrmî yê Ewropa da, diyalêktên zimanê Kurdî c piratîkê da mîna zimanê serbixwe dan û standin pêre tê kirin. Di afirandina v karesata netewî da, Kurda bixwe rolekî bilind listine. Ger medya Kurda di v derbarê de şiyar nebe, waye, mîna ku min berê jî got, di dahatiyek nêzîk da, emê netewekê bibîn bi çend milletên biçûk. Bêgoman ewa ku li jor hat gotin, stran folklor û hunera netewî nagire nava xwe.

Ez ewqas li ser pirsgerêka ziman peyvîm, çimkî ziman bi kilîla kultur û rengdan

kesayetiya mirov dizanim. Çimkî dizanim, Kurda ji zimanê xwe pêda, ti nîşanek din yê neteweyî û wisa nemaye ku wan ji dagirkerên welatê wan cuda bike.

Nabe ku em li ser vê hindê bîrê nekin, çima ewa ku di çaxê 2500 salan bi Cihûya re nehat kirin, di 75 salan li bakurê Kurdistanê bi me re hat kirin. Cihû bi hizara sal, mîna arê binya dirik(dirî) bi serê wan de hatibû, di nava dinê de belav bibûn, li ziman û çanda xwe parstin. Lê em li ser axa bav û kalên xwe û tenê di 75 salan de zimanê xwe ji bîra dikin. Ger ji bîra jî nekin, namusa zimanê xwe dibin.

Ez hîvîdarim jî kes wiha nezane, ez di destpêka sedsala bîstan de dijî zimanê Tirk an jî her zimanekî din yê biyanî me. Berevajî wê, ez evîndarê her zimanekê me y ku li ser bistekê vê axê, çar kes pêdiaxivin, lê bi mercekê ku ez jî azad bim ç hilbijartinê da... bi agir û asin bi ser serê min de neyê sepanin, bi zorî nekin lê cîgirê zimanê min yê zikmakî. Ez bi hîvî me, rojek yê bê, di Kurdistanê azad serbixwe da zimanê Kurdî bibe zimenê fêrmî yê dewletê, di kolêcên edebiyat zimanên biyanî da, hizar kur û kiçên Kurd hînî zimanê Bêşêkçî û Cewahîrî û Seic û Hafîz bibin.

Ebdulla Peşêv

berkot@hotmail.com

Jêder û Jêrnivîs:

- 1 û 2. Sevyêtski însoklopîdîçêskî slavar. Mosko, 1985, R.522(Bi zimanê Rûsî).
3. Nasîlênîyê mîra, Mosko 1989, xişte(xaçepirs) hejmara 3, rûpel 10 (bi ziman Rûsî)
4. Sevyêtski însoklopîdîçêskî slavar. Mosko, 1985, R.688(Bi zimanê Russî).
5. Nasîlênîyê mîra, Mosko 1989, xişte(xaçepirs) hejmara 4, rûpel 431 (bi ziman Russî)
6. Bêgoman dibe(mumkine) dagirkerên Kurdistanê hevçax hemû sedemên jor t kar bînin, lê di qonaxê xuyakirî da, zêdetir li ser yekê îsrarê dikin.
7. Kurdistan TV, êvariya roja 12.05.200
8. Kurdistan TV, êvariya roja 19.05.200
9. Kurdistan TV, êvariya roja 23.04.200
10. Raste, zimanê îstandard hê bi temamî cîgir nebûye, lê piraniya normên w diyarin û xwe ji dana aliyekî tê wateya nezanîna wan.
11. Kanala esmanîya „, Kurdistan TV“ êvareya roja 26.05.2000

12. Ismaîl Bêşêkçî, çend gotin li ser ronakbîrên Kurd, weşanên Rewşen, 1992 Rûpel 86
- 13 û 14. Ehmedê Xanî, Mem û Zîn, Îtaliya, 1989, Rûpel: 24 û 25
15. Dîwana Nalî, Bexda, 1976, Rûpel: 107
- 16, 17. Dîwana Hacî Qadirê Koyî, Bexda 1986, R. 240 û 246
18. Dîwana Pîremêrê nemir, Bexda, 1970, Rûpel: 61
19. Ismaîl Bêşêkçî: Çend gotin li ser Ronakbîrên Kurd, Weşanên Rewşen, 1992
- 20 û 21. Hemen serûkanî, Rûpel 74-75 û Rûpel 25-26
22. Hîwa, hejmar 5, 20ê Gulana 2000 (kovara ku her 15 rojan carekê bi Ozgç Polîtîka re derdikeve.).
- 23 û 24. Dîwana Melayê Cizîrî, Tehran, 1361ê Îranî, Rûpel: 241 û 269
- 25 û 26. Hîwa, hejmar 5, 20ê Gulana 2000 (kovara ku her 15 rojan carekê bi Ozgç Polîtîka re derdikeve.).

(Têbînî 1.): Ew mirov an sazî ku hemû dinyayê ji xwe re bi nîştiman dihesibîne baweriya wî bi welat tune.

(Têbînî 2) Ew telîya an jî dava ku nêçîrvan ji bo rav û nêçîrê datîne, gave ew te diteqe êdî hereket nake. Ger kesek bêdeng be, bi Soranî dibêjin: demî tele teqîwe!”

tirej.com

tirej@tirej.com

©copyright

tirej.com,2002-2004 [info@tirej.com] vebûna malperê 01/12/2002